

Nûce û Calakî

Nûçe û Çalakî

Ûsivê Hersan**Koça dawîn bar kir**

Sala 1918an, li gundê **Sêmitikê Newaf**, girêdayî navçeya Amûdê, Ûsivê ji diya xwe bûye, ji piçûkaniya xwe ve, dest bi kar û xebata kurdewariyê kiriye û di Komela Xoybûnê de bûye endam. Li ser destê zanyarên zimanê Kurdî, ew hînî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bi tîpên latînî dibe. Gelek berhem û gotarên wî di kovara Hawar, Ronahî, Roja Nû û Stêr ê de têne weşandin. Piştî damezrandina yekemîn rêxistina Kurdî li Sûriyê sala 1957an, careke din ew li kêleka xebatkarên Kurd cihê xwe digre û barê xebatê hildigre ser milên xwe. Ji ber çalakiyên wî, gelek caran ew avêtine binê zindanê û bi hovîtî ew eşkence kirine.

Roja Sêşembê 24.08.2010Z, li bajarokê Amûdê, dilê vî xweşmêrî hêja bi temenê 92 salî rawestiya. Roja Çarşembê 25.08.2010 an, bi beşdariya birek ji dost, welatparêz û aliyên Tevergera Kurdî li Sûriyê û xelkên Amûdê, termê wî di goristana bajêr de bi kul û hesret hate veşartin.

Bi vê boneya dilêş, weşana NEWROZê birûska sersaxiyê a jêrîn pêşkêşî mlbata wî kir:

**Birûska sersaxiyê**

Malbata gorbuhuşt, Ûsivê Hersan...

Bi dilekî tev kul û kovan, me nûçeya koçbarkirina zimanhez û welatparêzê Kurd ê navdar Ûsivê Hersan bihîst.

Hê ji beriya derdora 65 salan, Ûsivê Hersan ê ciwan, yê ku ji welat û zimanê dayika xwe pir hezdkir, xwe li ser destê pispore û zanan hînî xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî kiriye û bûye aboneyê kovara HAWAR ê, ji kaniya wê ya

zelal ava kurdayetî, welatperwerî û wefadariyê vexwariye û li kêleka berevan û çalakvanên doz û zimanê Kurdî cih girtiye.

Piştî damezrandina Xoybûnê, ew dibe endamê wê û bi mîrxasî erk û stubarên xwe yên netewî pêk tîne. Herwiha di warê zimanê Kurdî de jî, Ûsivê gorbuhuşt di kovarên Kurdî yên wê demê de mîna (Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr..) bi navê xwe yê aşkere gelek gotaran dinivîse.

Bila serê we sax be û cihê wî buhuştê rengîn be!

Desteya weşana NEWROZ

25.08.2010Z-2622K

Jineke Kurd hilkişiya Çiyayê**Hîmalaya û serkeftî vegeriya**

Beyan Faziliya jina çiyager a Kurd a xelkê bajarê Mehabadê ku di meha Tîrmehê de bi hevalbendiya giropekî çiyager a bi navê "Ewraz" çû rêzeçiyayê Hîmalayê û karîbû wî çiyayî bibire û navê xwe wek jina çiyager a serkeftî ya Kurd di rêza listeya serkeftiyên çiyayê Hîmalayayê de tomar bike.

Beyan Faziliya piştî ku ji Hîmalayayê bi awayekî serkeftî vegeriya bo bajarê Mehabadê, ji aliyê akinciyên wî bajarî ve, bi germî hate pêşwazîkirin û serkeftina wê hate pîrozîkirin. Beyan Fazilî ev heşt sal in çiyager e.

Rêjeya tund û tûjiya dijî jinê**li Silêmaniyê bilind dibe**

Rêvebiriya dezgeha şopandina tund û tûjiya li dijî jinê li Silêmaniyê ragihand, ku hejmara rewşên tundiya li dijî jinê li parêzgeha Silêmaniyê ji par bilintir bûye.

Rêvebirê beşê şopandinê, Beşder Reşîd got: Hejmara dozên ji hêla jinên ku rastî lîxistinê hatine di şeş mehên pêşîn ji vê salê giha 751 dozê. Di şeş mehên pêşî ji sala 2009an 603 doz bûn.

B. Reşîd ji perlemana Kurdistanê xwest, ku ew projeyaseya rakirina tundiya malbatî pê bawerdan bidin.